Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Gişti Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Hejmar (528)
2026-10-22

www.agirimedia.org




DI VÊ HEJMARÊ DE:

Rojev ..... 7
Hevpeyvîn ..... 8
Civakî .....10
Mafê Mirov ..... 11
Poster..... 12

# Dahênana modêlên biyanî û kopîkirina wê bo neteweyekê, hewcebû îro û zû bersiva xwe wergirtiba, ne ku bimîne û paşerojê aloz bike



**Întegrasyon, ji rê derxistina daxwaza mafê diyarkirina çarenivîsa Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê.**

**Bi sedan salan e gelê Kurd wek neteweyeke resen, xwedî xak û dîrok, nirxên giran dane ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî û rizgarbûn ji bindestiyê. Cewherê rizgarixwaziya Kurd, her ji şoreşa Simkoyê Mezin ve heta îro, her dem pêkhatiye ji avakirina stato û deshilata serbixwe ya neteweyî, xwebirêvebirin (xudmuxtarî) wek deshilatdariya Kurdistanê bi destê Kurdan xwe ve û mafên neteweyî wek zimanê fermî yê perwerde û îdareya Kurdistanê, heta digehîje federalîzmê û avakirina dewlet û welatekî serbixwe, ku tê de Kurd biryardarê xak û çarenivîsa xwe be.**

**Întegrasyon ku di rastiyê de demeke wek çemk û peyveke nûhatiye ser zimên, wateya wê di cewherde hewlek e bo helandina taybetmendiyên neteweyî di nav çarçoveya dewlet-neteweyên deshilatdar de. Ev model, radestkirina mafê xwedîderketina li xak û serweriya neteweyî ye bi dagirkeran, bi dirûşmên şewqdar ên wekheviyê û mafên îdarî di nav heman desthilata dagîrker de. Ev yek ne tenê neguncav e li gel cewherê daxwazên rewa yên Kurdan, belkî rewayet dane bi wan deshilatên navendî ku bi sedan sal e mafê serweriyê ji Kurdan zewt kirine.**

**Di vê dema hestyar de, anîna pêş a ramana întegrasyonê ji aliyê PJAKê ve (lîqa PKKê li Rojhilatê Kurdistanê), çandina tovê qebûlkirina bindestiyê, înkarkirina mafên rewa yên neteweyî yên Kurdan û paşvebirina xwestek û daxwazên neteweyî yên gelê Kurd e. Gelê Kurd li Rojhilat bi dirêjahiya dîrokê qurbanî daye bo rizgariya ji dagirkeriyê û bo bidestxistina serweriya xwe, niha arastekirina têkoşînê ber bi întegrasyonê di nav çarçoveya dewleta Îranê de, piçûkkirina armancên mezin e bo daxwazên neniştimanî û bêçine. Xwediyên vê teorî û nêrînê, hemû taybetmendiyên neteweyî û dîroka têkoşîna Rojhilat dixin bin pirsiyarê û daxwaza rizgariya neteweyî dadixin astê têkelbûnê bi bingeh û peykerê deshilata dagîrker re.**

**Mafê diyarkirina çarenûsê û xwedîderketina li kiyanekî serbixwe, rêyeke bêveger a neteweyî ya Kurdan e. Her nêrîn û modeleke ku bixwaze doza Kurd bîne asta daxwaza întegrasyonê de kêm bike, li gel xwestek û ruhê têkoşîna Kurdistanê hev nagire, û eger li cîhekî din jî hatibe ferzkirin, bi kêmanî li nav Rojhilatê Kurdistanê cîhê wê nabe.**

## Ji serhildana li dijî Komara Îslamî heta avakirina civakek hişyar



Mijara vê rûpelê derbarê rol, pirsgirêk û peywendiya nifşên “Z” û “Alfa” yên Kurd di nav civaka Kurdistanê de û li hember deselata Komara Îslamî ya Îranê disekine.‹Ji aliyê Xatûn Sîmîn Rûhanîzade ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 5

## Efsaneya Entegrasyonê û Tundûtûjiya Eşkere



Mijara vê rûpelê bi giranî rexne li têgeha “entegrasyonê” (yekbûn/guncandin) û awayê sepandina wê li ser gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê (Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriye) dike.‹Ji aliyê Rêzdar Serbest Urmiye ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 4

## Nemana ewlehiya rêjîma Îranê




Mijara vê rûpelê li ser kêmbûn û herrifîna sîstema ewlehiyê ya rêjîma Îranê piştî bûyerên 7’ê Cotmehê (Oktober) ye.‹Ji aliyê Rêzdar Azad Kurdî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 9

# Mistefa Mewlûdî: Ji bo Hizba Dêmokrat, pîvan û bingeha sereke dengê raya giştî û şeqamê a kurdî ye li Rojhilatê Kurdistanê

**Rêzdar Mistefa Mewlûdî, cêgirê sikirtêrê giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) di hevpeyvînekê de digel Azadî Tv û li derheq helwêsta Hizba Dêmokrat û dawî rewşa pirsa Kurd li vê perçeya Kurdistanê, wiha bersiva Ewin Hekîmpûr pêşkêşkara vê Tv yê da, ku ev bi kurtî naveroka bersivan e:**



Mistefa Mewlûdî, cîgirê sekreterê giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) ragihand ku qonaxa niha dikare wekî derfeteke girîng ji bo kurdên Rojhilatê Kurdistanê bê dîtin di pêxema gihîştina mafên wan yên rewa de, hevdem tekez kir ku bêyî çareserkirina pirsa kurd, Rojhilata Navîn ti carî aştî û aramiyê bi xwe ve nabîne.

Mewlûdî di çarçoveya hevdîtinekê de di bernameya «Azadî» Tv de ku biryar e di van nêzîkan de hemî ev hevpeyvîn bê weşandin, li ser hevkeşên herêmî û pevçûna bereyan axivî û destnîşan kir ku şer û pevçûnên niha yên Rojhilata Navîn di navbera Amerîka û Îsraîlê li gel Komara Îslamî ya Îranê û proksiyên wê li herêmê de kir, û Mewlûdî tekez dike ku encama cûreyê siyaset û kiryarên rêjîma Îslamî ya Îranê ziyaneke rastrast gihandiye berjewendiya gelên Îranê, welatên Rojhilata Navîn û pêvajoya berjewendiya zilhêzan li herêmê û her ev jî bûye sedema çêbûna vê rewşê.

Cîgirê sekreterê giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê derbarê rewşa kurdan di navbera alozî û bereyên şer de, dubare kir ku ewlehiya herêmê bi awayekî bingehîn girêdayî çareseriya dadperwerane ya doza kurd e û bêyî vê yekê û heta mafê gelê Kurd dabîn nebe, herêm bi berdewamî di ne-aramiyê de dimîne. Her di wê çarçoveyê de rêzdar Mewlûdî bal kişand ser wê yekê ku pirsa kurd li Rojhilatê Kurdistanê pirseke germ, zindî, micid û serdemî ye û nayê piştguhxistin, belkî pêdiviya wê bi çareseriyeke yekcarî û micid heye.

Mistefa Mewlûdî di beşeke din a axaftina xwe de û derbarê pêvajoya aştiyê û destpêşxistinên taybet bi diyalogê ku di civînên van dawiyan yên «Mêrî» de hatibûn rojevê, ragihand: Guftûgo û danûstandin hemû demê wekî yek ji rêyên gihîştina bi aştiyê dimîne, lê ji bo Hizba Dêmokrat, pîvan û bingeha sereke li Rojhilatê Kurdistanê deng û raya giştî a gelê kurd e.

Navborî tekez kir ku ew hemû demê bi guhdarîkirina daxwaziyên xelkê, siyaset û gav û daxwaziyên siyasiyên Hizba xwe dixin ber behsê û biryarê li ser didin, wate siyaseta Hizba Dêmokrat li ser bingeha daxwaza xelkê Kurdistanê tê darêtin û pêşxistin.

Mistefa Mewlûdî derbarê taybetmendiya xebatê li Rojhilatê Kurdistanê û redkirina pêvajoyên dişibin yên parçeyên din, cixîza jihevcudaker kişand û ragihand ku kurdên Rojhilatê Kurdistanê bi xwe biryardarê sereke ne li ser diyarikirina şêwazê xebatê û aliyê siyasetên xwe di pêxema diyarikirina mafê çarenûsa xwe de.

Herwisa tekez kir ku her parçeyekî Kurdistanê xwediyê şert û merc û rewş û taybetmendiyên siyasî-civakî yên xwe ye û li gorî wê rastiyê xebatê dike, ji wî alî ve jî cîbicîkirina ti pêvajoyeke hevseng û kopîkirî ji parçeyên din yên Kurdistanê li Rojhilatê Kurdistanê bersivder nîne û bi cih nabe.

Cîgirê sikirtêrê giştî yê Hizba Dêmokrat di dawiya axaftina xwe de û di bersiva pirsiyarekê de derbarê girtinebera siyaseta «yan hemû, yan hîç» û destnîşankirina armanca stratejîk a xebata Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, ragihand ku armanca dawî ya wan, bidestveanîna mafê diyarikirina çarenivîsê ye ji bo kurdên Rojhilatê Kurdistanê û xebat û têkoşîna Hizba Dêmokrat ji bo wê yekê ye ku di çarçoveya dewleteke azad, dêmokrat û federal li Îranê de, hemû mafên neteweyî, siyasî, civakî û aborî yên gelê kurd bi fermî pêk bên û biparêzin.

**Ev bi giştî naveroka axivtinên rêzdar Mistefa Mewlûdî bûn ku di hevpeyvîna digel Azadî Tv de axivîn, ku deqa vê hevpeyvînê dê di demekî zû de bê weşandin.**



# Naxwazim bihelim!



N. Aso Minberî



Li rojên borî de pirsiyara entêgrasya (integrasyon), bûye babeteke germ ku kesên rayedar her yek ji aliyê xwe ve û li rastiya parastina nasnameya Kurdistanîbûnê de, şirove bo dikin.

Aşkere ye ku li hemû salên borî de, pirsiyara asîmîlasyonê yan helandina çandî yek ji wan mijaran bûye ku her takekî kurd ku xwe li çarçoveya pirsa neteweyî de bi berpirsiyar zanibe gelek bi hûrî fikir lê kiriye û li pêxema dijayetiya ligel vê mijarê gav havêtiye.

Asîmîlasyon li pênasa zanistên civakî û siyasiyan de, bi pêvajoyekê tê gutin ku tê de, kêmaneyeke neteweyî, çandî, zimanî yan olî li nav çand û nasnameya zorîneyê de dihele û nasnameya serbixwe ya xwe ji dest dide.

Ev ji bo me yê kurd ku li Rojhilatê Kurdistanê dijîn, pênasa wê ev e: Hewlên neteweya desthilatdar bo helandina me û standina nasnameya Kurdistanîbûna me, ku dibe ew neteweya desthilatdar jî li gorî amarên heqîqî, zorîne nebe û tenê desthilat li dest be!
Pirsiyara asîmîlasyonê, pirsiyareke ku Komara Îslamî li hemû salên borî de hewl daye wek rêyeke berdewam, dirêjî pê bide û hûr-hûr me bihelîne û asmîle bike.

Li rêya asîmîlasyonê de, civak li bin fişarên cûrjecûr de, dest ji çand, adet û nirxên xwe berdide û hevdem, ziman, dîrok û nasnameya civaka desthilatdar werdigire, ev hewle bo me ku salên zor li bin fişara hemîaliyane ya desthilata Komara Îslamî de jiyayn e, pirsiyareke nas û elbet tal e jî, bo vê armancê kerta perwerde û pêgihandinê roleke berçav gêrandine û li rêya bi zorêkirina xwendin û axaftin bi zimanê farsî li qutabxane û zanîngeh û bi fêrkirina dîroka pir ji çewt û derew û hevdem sepandina xwasta desthilata zal, hewl hatiye dan neteweyeke asîmîle ya dûrkeftî ji nasname û nirxên neteweyî ya xwe çê biket.

Tekeziya gelê kurd li ser dijayetiya ligel asîmîlasyonê rast bi wê armancê bûye ku nifşa paşerojê, li ser xaka bab û kalên xwe, bi zimanê bîhanî neaxive û cudahiya dîrokî, çandî û nasnamêyî ya xwe ligel ewê dinê baş bizanibe.

**Li vê rêya asîmîlekirinê de, desthilat li rêya zordarî û tepeseriya tundutîj û berdewam ve û baştir bêjin bi zimanekî req, hewl dide neteweya jêrdest neçar bike ku bibe tiştek ji neteweya serdest! Ev hewla Komara Îslamî herçend serkeftî nebûye, lê berdewam bûye ta ciyê ku niha li formeke xemlandî bi dêmokrasiyê de û li bin navê entêgrasyonê dixne pêşya xelkê û weha nîşan didin ku goya li vê şêwazê de, mafê takê kurd bidestve têt!**

Ewa ku niha li Îranê de bi navê “entêgrasya” pûropaganda bo tê kirin, rêçare ku tê de mafê yeksan û parastina nasnamê destebêr biket nîne, ev rûkeşeke birqoke bi navê dêmokrasiyê ye ku dikare wekî asîmîlasyoneke dilxaz nav lê bête birin.

Piştî salên dûr û dirêj li xebata neteweyî li Kurdistanê û pêdagiriya neteweya kurd li ser man e û parastina xak û nîştiman û nasnameya xwe, weha kiriye ku Komara Îslamî ev pirsiyar bo helandin û kelîkirina kurd bikar bîne!

Ez hez dikim vekirina beşa ziman û wêjeya kurdî ya Zanîngeha Îlamê wek mînak bînim. Mînakekî aşkere li rastiya entêgrasya û helandina dilxazane! Takê kurd bi aliyê herî kêm a mafê xwe anku xwendina zimanê kurdî li zanîngehê razî dibe û pirsa perwerde bi zimanê kurdî êdî tête piştguhxistin!

Dema ku desthilat dizane ku nikare zimanê neteweyekê bi temamî jinav bibe, hewl dide ku xwe bibe birêveberê zimanî û çarçoveya wê bi dilxazê xwe dabirêje. Wê demê tak bi xwasta xwe diçe nav çarçoveyeke kontrolkirî ve ku desthilatê bo wî diyarî kiriye.

Li zanistên siyasi û civakiyan de, entêgrasyona rasteqîne li ser du bingehên sereke hatiye ava kirin, îtrafa fermî bi cudahiyên kêmîneya neteweyî û parastina nasnameya wan û herwisa dana derfeta vekheviya siyasi, aborî û civakî bo beşdarî li desthilatê.

Li vê modelê de, dewlet wek dezgehek bo yekdestkirina zorê kar naket. Bi berewajî vê pîvanên zanistî, ewa ku li bin sîbera Komara Îslamî de bi navê entêgrasya dıxwezin cîbicî bikin, cûre asîmîlasyona dilxaz e ku desthilat, bi fêlekê wek vekirina beşa kurdî li zanîngeheke wek Îlam, bi şêweyeke sînordar û li bin kontrola xwe de, dest pê dike û hevdem jî navoroka siyasi, dîrokî û zimanî ya neteweya kurd dişêlînin.

Li wir de pirsiyar ew e ku çawa dibe hin kes bi nav û bi nûneratiya gelê kurd ve biçin bin barê cîbicîkirina entêgrasya li Kurdistanê?

Têgehiştin li vê babetê hişyariyeke zanistî û neteweyî beramber bi forma serkut û asîmîlasyona req e. Cîgirbûna maf û azadiya takê kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi razîbûn bi aliyê kême mafê wek xwendina zimanê kurdî û druşmên biriqedar û xemlandî bi dêmokrasiya derewîn, bedest ve nayê, em wek neteweya kurd bi salan e xebatê dikin û bi kiryar me îsbat kiriye ku em naxwazin bihelin û jinav biçin!

Mafê kurd li Rojhilatê Kurdistanê, bê destebêrbûna mafê diyarkirina çarenûs û parastina nasnameya Kurdistanîbûna me, li çarçoveya her cûre sazanekê de bê wate ye.

# Efsaneya Entegrasyonê û Tundûtûjiya Eşkere



N. Serbest Urmiye

Di zanistên nûjen ên siyasî û yasaya navneteweyî de, têgeha entegrasyonê, weke pêvajoyeke sivîl, rêkxistî û li ser bingeha «peymana civakî ya nû» tê pênasekirin. Di vê pêvajoyê de, kêmaniyên etnîkî, zimanî û neteweyî di çarçoveya rêkxistineke pirreng û piralî de dibin xwedî mafên weke kev yê hemwelatî bûnê, ewlehiya tevav û nûneratiya siyasî ya dadperwerane.

Lêbelê, ezmûna jiyanî û dîrokî ya gelê Kurd ê parvekirî bi ser çar welatên Tirkiyê, Îraq, Sûriye û Îranê de, vê çendê diselimîne ku entegrasyon, ne bi wateya yekgirtina neteweyan e, belku xwe teslîmkirin û vegeriyan bo hembêza desthilata navendî tê şirovekirin.

Di rasiyê de bûye terzek ji hilweşandina zordestî, ewlehîkirina sîstematîk a herêmê û hewldan ji bo ji holê rakirina nasnameya dîrokî.

Raporên ku li dor bûyerên dilhejîn ên ku di qonaxên cuda de derbarê tundûtûjiya eşkere li dijî çalakvan û têkoşerên Kurd hatine weşandin ji tepeserkirina tund a xwepêşanderan, bêhurmetîkirin û îşkencekirina sembolên berxwedanê, birîna serê xebatkaran û keziyên jinên têkoşer û avêtina termê jin û şervanên Şehîd ji bilindahiyan, heta hilweşandina pêkhateya xweser, tenê kiryarên xweser û tundajû yên çend hezar leşkeran nînin, belkî dikarin wekî belge û encamên rastîn ên şêwaza entegrasyona bi zorê di nav rêkxistina dewlet-neteweyên navendparêz ên Rojhilata Navîn de bên nirxandin.

**Şaş têgihîştina Entegrasyona Dêmokratîk li Hember bişavtina zordestî de**

Li gor ramanên civaknasîya siyasî û mafên mirovan, yên Will Kymlicka û Anthony D. Smith, entegrasyoneke xwezayî û rewa pêdiviyê du mercên bingehîn e, Naskirina nasnameyên cuda û garantîkirina sîstematîk a beşdarî di desthilatê de.

Di Rojhilata Navîn de, dewletên dagîrkerên Kurdistanê, peyva entegrasyonê wekî perdeyekê ji bo asîmîlasyon anku bişavtina zordestî bi kar anîne:

**Tirkiye:** Modela entegrasyonê li Komara Tirkiyeyê piştî Peymana Lozanê (1923), li ser bingeha îdeolojiya yekrengkirina etnîkî (yek netewe, yek ala, yek ziman) hatiye avakirin. Înkara nasnameya Kurdî û qedexekirina perwerdehiya bi zimanê dayikê di heyamê gelek dehsalan de nîşan da ku entegrasyon li Enqereyê bi wateya hilweşandina nasnameya Kurdî di nav neteweperestiya Tirkî de bûye.

**Sûriye:** Entegrasyona bilez an jî bi zorê ya hêzên Kurd di nav pêkhateya leşkerî û îdarî ya navendî de, bêyî dan yan hebûna garantiyeke rastî di destûra bingehîn de, dikare bibe cureyek ji teslîmbûna leşkerî û çênekirina nasnameya siyasî. Ezmûna bêparkirina bi sedan hezar Kurdan ji mafê hemwelatiyê di serjimêriya sala 1962an li Hesekê de û projeyên endezyariya demografîk, wekî Kembera Erebî, yê bûye çavkaniya bêbaweriyeke kûr û domdirêj.

**Îran:** Modela yekrengkirinê ji serdemê Pehlewiyan de dest pê kir û piştî sala 1979an, bi aliyên îdeolojîk û ewlehiyî ji nû ve hate pênasekirin. Navendparêziya tund a aborî û siyasî, tevî ewlehîkirina daxwazên sivîl û zimanî, derfeta entegrasyoneke xwezayî li ser bingeha mafên hemwelatiyê yên wekhev gelekî sînordar û asteng kiriye.

**Îraq:** Entegrasyona bi navê xwe li Iraqê, di serdemê desthilatdariya “Beisê” de bi siyasetên jenosîdê, Erebkirinê û Enfalê re derbaz bû. Piştî sala 2003an jî, bi astengiyên Bexdayê li hember cî bi cî kirina madeyên peywendîdar bi federalîzmê ve, wekî madeya 140an a destûra bingehîn, rû bi rû bûye. Ev yek bêbandoriya modela entegrasyona bê garantî eşkere dike.

**Tundûtûjî li Dijî Hebûn û Nasnameyê: Hêmaya Tepeserkirina Desthilata Navendî**

Di zanista lêkolînên li dor ewlehî û aloziyên çekdarî de, dema ku amûrên tepeserkirinê dest bi wêrankirina sembolên çandî û nasnameyî dikin, wekî bêhurmetîkirina têkoşeran, îşkenceya eşkere an jî birîna keziyan berdengê wane ne tak, belku civak hemû ye.



Hebûna jinên têkoşer ên Kurd di tevgerên civakî û siyasî de sembola serxwebûn, îradeya giştî û rêkxistina sivîl e.

**Bi armancgirtina van sembolan bi terzên hov û nemirovane du karvedanên sereke dişopîne:**

**1. Afirandina tirs û xofê di nav civakê de:** Şandina vê peyamê ye ji civakê re ku bihayê xwedîderketina daxwazên nasnameyî û rêkxistinê, dikare bibe hegera ji destdana bi tevahî ya rûmet û keremeta mirovî.

**2. Hilweşandin û alozkirina hizra giştî:** Êrîşkirina li ser sembolên çandî, wekî keziyên jinan ku di çanda Kurdî de dikarin sembola berxwedan, şîn û şahiyan bin hewldanek e ji bo tevlîhevkirina hêza derûnî û ruhî ya neteweyekê.

Ev kiryarên tundûtûj nîşan didin ku pêkhateyên desthilatdar dikarin Kurdan ne wekî hevparên wekhev di rêvebirina welat de, belku wekî kesên ku divê bên kontrol û teslîmkirin, mêze bikin.

**Rexneya sîstematîk a Pêvajoya Entegrasyonê li Çar Welatan**

**1. Ewlehîkirina daxwaziyan:**

Li gorî teoriya “qutabxaneya Kopenhagê”, dema ku daxwaziyên bingehîn, wekî perwerdehiya bi zimanê dayikê, pêşketina hevseng a herêman û rêveberiya herêmî, wekî gef li ser yekparçebûna axê werin pênasekirin, danûsitandin û entegrasyona demokratîk ne mumkine.

**2. Nebûna garantiyên yasayî û navneteweyî:**

Her peymaneke entegrasyonê an çekdanîna herêmî, bê hebûna çavdêrên navneteweyî û dadgehên destûrî yên serbixwe de, di yekemîn derfet yan krîza siyasî de dikare ji aliyê desthilata navendî ve were binpêkirin û bibe sedema tepeserkirina ji nû ve.

**3. Newekheviya pêkhateyî û dûrxistin ji navendê:**

Heta ku semyanên giştî, hêza leşkerî û biryardanên bingehîn ên siyasî, aborî û … di destê paytextan de bin, têgeha entegrasyonê dê tenê bibe perdeyek ji bo veşartina newekheviya aborî û civakî di herêmên Kurdî de.

**Encam: Pêdiviya Ji Nû Ve Pênasekirina Terzê Jiyana Siyasî li Rojhilata Navîn**

Şirovekirina rewşa dîrokî û hemdem a Kurdan li Sûriye, Tirkiye, Îran û Iraqê dide xuyakirin ku entegrasyon di nav sîstemên tevahîxwaz û navendparêz de, aşitî û aramiyê bi xwe re nayîne, belku tundûtûjiya sîstematîk dike beşek ji pêkhate û destûra desthilatê.

Entegrasyon bê garantîkirina mafê diyarîkirina çarenûsê, fermîkirina bi tevahî ya ziman û çandê, û pêkhateya nenavendîê berdewamiya heman ramana kevn a zordarî û serdestiyê ye.

Heta ku dewletên herêmê û civaka navneteweyî, li şûna pejirandina pirrengî û piralîtiya rastîn de li pey sepandina şêwaza dewlet-neteweya yekneteweyî de bin, hewildan û îdiaya yekgirtina neteweyî dê ji bilî efsaneyeke îdeolojîk ji bo yasayîbûna tepeserkirinê, ne tiştekî din be.

# Ji serhildana li dijî Komara Îslamî heta avakirina civakek hişyar



N. Sîmîn Rûhanîzade



Nifşên “Z û Alfa” yên Kurd li hemberî du qonax û pirsgirêkeke dîrokî de ne: nifşa Z ku tama serhildanê li dijî nîzama serdest ceribandiye û nifşa Alfa ku hîn jî mijûlî nexişandina wêneyek ji cîhan, nasname û pêşeroja xwe ye. mesele tenê ciyawaziya temen di navbera wan du nifşan de nîne; pirsa sereke ev ye ka civaka Kurdistanê dikare hêza nifşa ciwan bike bi hişmendiya siyasî û hişmendiya siyasî jî bike bi hêzeke domdar ji bo guhertinê, an na deselata hakim derfetê peyda dike û hişyariya wan nifşan berî gihîştina encamekê bêdeng dike.

Tevgera Jin, Jiyan, Azadî di sala 1401an de nîşan da ku nifşa ciwan a Kurdistanê, bi taybetî jin û ciwan, êdî amade nîne ku nîzama sepandî ya Komara Îslamî wekî qederek neçar a xwe qebûl bikin. Herçend netirsiya wan li ser şeqaman hewce û karek dîrokî bû, lê bi tenê ji bo guhertina hevsengiya hêzê bes nebû û nîne. Deselat û hikûmet tenê bi serkutkirina nerazîbûnan zindî namînin; ew ji mandîbûna civakê, nemana pêwendiya di navbera nifşan de, bêhêvîbûn ji guhertinê û ji guherîna kerib û kîna siyasî bo bê emeliyê û neçalakiyê jî dikare zindî bimîne.

Ji ber vê yekê, ceribandina rastîn a nifşa “Z” tenê hebûna wan li ser şeqaman de nîne; belkî ew e ku bikaribe pêwendiyan ava bike, hizir û bîrek hevpar biafirîne û biparêze, ramana siyasî biafirîne û torên civakî û çandî yên domdar ava bike ku di navbera du pêlên nerazîbûnan de ji hev belav nebin û berdewam berhemên xwedî bandor bidin civakê û bixin ber destê nifşa Alfa.

Ji aliyekî din, nifşa “Alfa” ku di cîhaneke nû de mezin dibe û beşeke mezin a perwerde, ziman û têgihiştina wê ya jiyanê bi rêya dibistanê, mobayîl, torên civakî û elgurîtimên dîcîtal tê şekildan. Di rewşek wiha de, deselata hakim serweriya xwe tenê bi qedexe û serkutê nade sepandin; gelek caran bi riya asayîkirinê bernameyên xwe birêve dibe. Mînak bo vê yekê dema ku zimanê dayikê ji perwerde û zanistê bê dûrxistin, çanda Kurdî di qada dîcîtal de hebûneke sînordar hebe û zarok ji bo derbaskiria dem, fêrbûn û nasîna cîhanê neçar bimîne naverokên ku tê de ziman û nasnameya wî nîne, bikar bîne rastî hin valatiyan tên û ev valatî jî wan rastî pirsgirêkên nasnameyî û xwe bi kêm zanînê û rastî kirîza nasnameyî dike, Ji ber vê yekê, parastina çand û zimanê Kurdî divê tenê di çarçoveya dirûşmêm rojên taybet de nemîne.

Ziman divê zimanê zanistî, lîstikê, teknolojiya, henekê, muzîkê, perwerdeyê û karên rojane be. Heke nifşa “Alfa” nikaribe cîhana nûjen bi zimanê xwe biceribîne, nikare di paşerojê de bi tenê berpirsiyariya parastina nasnameya xwe be.

Li vir berpirsiyariya nifşa “Z” zelal dibe: avakirina ev tiştên ku nifşên berê, di bin givaşa serkut û bêparbûnê de derfetek zêde ji bo pêşxistina wan nebûn. çêkirina naverokan bi zimanê Kurdî, fêrbûna şiyanên dîcîtal, girêdana zanist û teknolojiyayê bi hewcedariyên civakê, tomarkirina dîroka devkî û ezmûnên têkoşînan, û avakirina pêwendiyê di navbera ciwanên di nava Kurdistanê û diyasporayê eva dikeve ser milê nifşa Z ; eva beşek ji siyaseta rizgariyê ne.

Her qadeke ku tê de ciwanekî Kurd bikaribe bi zimanê xwe fêr bibe, bifikire, biafirîne û bi cîhanê re pêwendiyê çê bike, beşek ji qada berxwedan li dijî asîmîlasyonê ye û rêya wan nifşan vekirî dike û siyasetên deselata hakim red dike.

Ev beşên ku me baskirin,nabe weke têkoşîna çandî bê dîtin. Siyasetên cudakariyê, pêşketina newekhev, bêparbûna aborî û wêrankirina jîngehê, derfeta man û avakirina paşerojê ji hin beşên civakê distînine. jinavbirina çavkaniyên xwezayî û wêrankirina ekosîstema Kurdistanê ji pirsa hêz û dadweriyê nayên veqetandin; herwisa bêkarî û koçkirina neçar a ciwanan jî tenê pirsgirêkên şexisî nînin.

**Nifşek ku dixwaze paşerojê biguherîne, divê bikaribe di navbera mafên zimanî, dadweriya aborî, parastina jîngehê û mafê diyar kirina çarenûsa xwe de pêwendiyekê ava bike; ji ber ku rizgarî bê îmkana jiyanek baştir, kar û biryardana li ser pêşeroja xwe, weke têgehiştinek natewaw dimîne û nifşan rastî hin tevlîheviyan dike.**

Lewma nifşa “Z” nabe rola weliyê nifşa “Alfa”bileyize; divê ji bo wê nifşê ku hîn di pêvajoya avabûnê de ye, derfeta pirsîn, fêrbûn û hilbijartinê pêk bîne, derfetê bo vê nifşê ava bike ku bikare bipirse û baş û xirab, siyasetên deselata hakim binase û bixwîne û li hember de bertek hebe. Çimkî pêşeroja Kurdistanê tenê di bîranîna serhildanan de nabe bê kurt kirin, belkî di şiyana civakê de tê avakirin, di demekê de ku bikare dîrokê û serhatiyên civakê veguherîne bo zanîn, sazî, çandeke zindî û îradeya siyasî.

Carek din dibêjim Komara Îslamî dikare şeqaman bigire, perwerdeya bi zimanê dayikê sînordar bike û têçûya nerazîbûnê zêde bike; lê bersiva domdar a li hemberî wan givaşan, kerib û kîna zêdetir nîne, belkî avakirina civakeke hişmendtir, xwedî ramantir û bihêztir e. paşeroja Kurdistanê wê demê ji destê hêzên serkutkar der dikeve ku nifşa ciwan ne tenê ji bo nerazîbûnê, lê ji bo avakirina mêkanîzmekê ku bikare wan nerizayetiyan bike dînama guhartinan û avakirina civakek azad ku jêhatiyê her mirovekê be.

Rohin kirin : nifşa “Z” bi gelemperî kesên di navbera salên 1377’an heta 1391’an rojî de hatine dinyayê, û nifşa “Alfa” jî kesên ku nêzîkî navbera salên 1389’an heta 1403’an de hatine dinyayê. Ev her du nifş ji aliyê temenî ve nêzkî hevin, lê di şert û mercên cuda de mezin bûne.
Nifşa “Z” pêvajoya derbasbûnê bo cîhana dîjîtal û ezmûna kirîz û tevgerên nerazîbûnan yên weke Jin, Jiyan, Azadî dîtine; lê nifşa Alfa ji salên yekem yên jiyana xwe de di bin bandora teknolojiyên dîcîtal û elgorîtima medyayê de mezin dibin.

# Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas

**Beşa Nehem**

Rojavayê Kurdistanê di Navbera Tengbûna Erdî û Tengbûna Qada Ramyarî de

Pergala federal a nenavendî, tevî êrîş û dijberiyan, ji bo hemû Sûriyê, ne tenê Kurdan, çareseriya herî guncaw dimîne. Federalîzm ne projeya dabeşkirinê ye, wek Tirkiye û hêzên Erebperest ên Îslamî û neteweyî belav dikin, rêyek e ji bo rizgarkirina dewletekê ku êdî ji navendekê tenê nayê rêvebirin. Pevçûnên berdewam, heta di dema desthilata veguhêz de jî, vê rastiyê eşkere dikin.

Sûriyeya ku şer perçe kiriye, nakokiyên olî kûr kirine û artêş û rêxistinên tundrew lê pêşbaziyê dikin, nikare vegere heman qalibê kevn û ji gelên xwe baweriya serdemeke nû bixwaze.

Navendperestiya Esed û Beasê amûreke hilweşandinê bû, vejandina wê bi navê yekîtiyê bingeha pevçûnên nû amade dike. Federalîzm, an nenavendîtiyeke berfireh a di yasa bingehîn de parastî, dikare pirrengiyê ji çavkaniya şer veguherîne bingeha lihevhatineke ramyarî.

Tirkiye ji vê şêwazê ditirse, ji ber ku naskirina mafên Kurdan di yasa bingehîn a Sûriyê de rêgeza nasnekirinê ya ku ji Atatürk heta îro di pergala wê de serdest e, dixe ber pirsê.

Ji ber vê yekê zextê li Şamê dike, hewl dide nûnerên Amerîkayê bîne ser dîtina xwe, û desthilateke navendî dixwaze ku li hember Kurdan xurt, lê li hember Enqere lawaz be.

Enqere ji Sûriyeyeke yekgirtî zêdetir Sûriyeyeke di bin bandora xwe de dixwaze; rê li ber her nimûneyeke Kurdî digire ku dikare bibe bingeha mafên domdar. Ji ber vê yekê, parastina federalîzmê parastina serxwebûna Sûriyê ye jî. Dewleteke ku biryarên wê li gorî pêdiviyên ewlekariya Tirkiyeyê bên girtin, dê tenê bi navê xwe serbixwe bimîne.

Pêşeroj bi guhertina têkiliyên Amerîka û Îranê, û lawazbûna hêzên girêdayî Tehranê, nezelaltir dibe. Nêzîkbûn an pevçûneke nû dikare hevsengiyên herêmê biguherîne û heta nexşeyên erdnîgarî jî bixe ber guhertinê. Ev ihtîmal tirsa Tirkiye, Sûriye, Îran û Iraqê zêde dike. Lê ji bo Kurdan, veguherîn bi tena serê xwe ne soza destkeftinê ye; bê amadekarî dikare bibe qonaxeke din a windakirinê.

**Piştî pevçûna Îsraîl û Îranê, Dewletên Yekbûyî nîşan nedan ku ji bo mafên Kurdan amade ne têkoşîneke ramyarî ya bingehîn bikin. Lê ev maf dikarin di strategiya firehtir a Washingtonê li hember Îran û hêzên wê de bibin pêdiviyek, bi taybetî heger gef li ser berjewendiyên Amerîkayê û ewlekariya Îsraîlê berdewam bike. Wê demê nirxa Kurdan dikare ji rola leşkerî wêdetir biçe; ne ji ber deyndariyeke rewiştî, lê ji ber hesabên hevsengiyê.**

Dîsa jî Tirkiye di hesabên Amerîkayê de hevalbendeke giran dimîne. Washington dê ji hêrsandina Enqere xwe biparêze, heta ku berjewendiyên xwe an ewlekariya Îsraîlê ji kûlefa razîkirina wê girîngtir nebînin.

Şam dixwaze berî lihevhatina neteweyî navendê xurt bike; Tirkiye dixwaze projeya Kurdî betal bike; civaka navneteweyî jî gelek caran lihevhatina lezgîn ji dadmendiya domdar pêştir dide. Ev rastî divê bibe bingeha amadekariyê, ne sedema radestbûnê.

Tevgera Kurdistanî divê ji bendewariya parastina derveyî derbasî avakirina hêza hundirîn bibe: projeyeke zelal a yasa bingehîn, eniyeke ramyarî ya berfireh, aboriyeke berxwedêr, perwerde, ragihandin û dîplomasiya xurt.




Çek girîng e, lê nikare cihê van hemûyan bigire. Yekîtiya ku nikare bibe biryar û xebata hevpar, di dema danûstandinan de nikare mafan biparêze.

Ya ku bi navê tevlîbûnê tê pêşkêşkirin, ne her tim hevparî ye; dikare navê nermtir ê helandina ramyarî û çandî be. Şam dikare Rojavayê Kurdistanê vegerîne bin navendê, vê carê bi navê welat, welatîtî û yekîtiya olî.

Ev nasnekirin nabêje Kurd tune ne; dibêje ew tenê welatî ne, ne gel; kes in, ne netewe. Zimanê wan dikare li kêlekê bijî, lê ne wek mafekî bingehîn; erdê wan dikare devereke rêveberî be, lê ne welatekî dîrokî.

Rojavayê Kurdistanê gelek destkeft winda kirine, lê baweriya gelê wê nehatî windakirin. Ya maye bi bendewariyê nayê parastin; pêdiviya wê bi hişê rizgarkirina ramyarî heye.

Ev dema xurtkirina bingehan e, ne devjêberdana xewnê: divê xewn ji daliqandina bi hevalbendiyên derveyî veguhere projeyeke ku xwe dispêre yekîtiyê, zelaliya daxwazan, mafê li ser erdê û dadmendiya dozê. Axaftina bi cîhanê divê zimanê maf û berjewendiyan bi hev re bi kar bîne.

Ezmûnê nîşan da ku hêza leşkerî dikare erdê demekê biparêze, lê nikare bi tena serê xwe çarenûsê misoger bike. Hevalbendê ku ji deriyê şer tê, dikare ji deriyê lihevhatinê dûr bikeve; helwestên Amerîka û Fransa vê dersê didin. Tirkiye jî tirsa xwe ji rastiya Kurdî bi dijberiya federalîzmê eşkere dike. Şama kevn û nû nîşan didin ku navend, bê sînorên yasayî û parastina mafan, vedigere kontrol û nasnekirinê.

Ji ber vê yekê, pirs ne tenê firehkirina ezmûnê ye: çawa hilweşîna ya maye rawestînin û paşveçûnê bikin destpêka venêrînê? Çawa Rojavayê Kurdistanê bikin dozeke mafî û yasayî ya Sûriyê û cîhanê, ne dosyayeke ewlekariyê di destê Tirkiye û Şamê de? Nûnasandina têkoşînê divê wê ji girtîbûna di çekê de, ji qurbaniyên dirûşman û ji nexşeyên dinan derxe.

Rojavayê Kurdistanê di navbera paşveçûna leşkerî û derfeteke ramyarî ya teng de ye. Lê gel tenê bi erdê di destê wan de nayên pîvan; bi şiyana parastina hebûn û biryara xwe jî tên pîvan.

Heta gel serî li tunekirinê netewîne, erd navên xwe biparêze û bîranîn neşikê, derfet dikare bibe destpêkeke nû. Bi şertê ku em rastiyê wek ku heye bixwînin, ne wek ku me dixwest hebe.

**Berdewam dike...**

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Mewlûdî”:**

**“Qonaxa niha dikare wekî fersendeke girîng ji bo Kurdên Rojhilat bê dîtin da ku bigihîjin mafên xwe yên rewa”**



**“benjamin netanyahu”:**

**“Îsraîlê biryara herifandina rêjîma Îranê daye.”**



**“Donald Trump”:**

**“Em ê bi Komara Îslamî re danûstandinan nekin.”**



**“Yûsif Recî”:**

**“Wezîrê Derve yê Lubnanê :Lubnanê daxwaz ji rêjîma Îranê kir ku tedaxula xwe li wî welatî de bisekinîne.”**

# Îran, ji gefên li ser Tengava Hormozê heya hinardekirina têrorîzmê!



N. Eskender Ceiferî




Rêjîma Îranê ji bo aştiya cîhanî û aramiya li Rojhilata Navîn metirsiyeke mezin e. Dema ku mirov nûçeyên derbarê teqîna gemiyên petrolê li Tengava stratêjîk a Hormozê dixwîne û Spaha Pasdarên têrorîst ên Îranê eşkere basa girtina vê rêya deryayî ya girîng dike, rûyê rastîn ê desthilatdariya Tehranê careke din derdikeve holê. Rêjîma Îranê bacê werdigire û komên têrorîstî bi kar tîne.

Tişta ku wekî nîşandana hêza leşkerî tê dîtin, di rastiyê de tevgera desthilatek rizî ye ku yasayên navnetewî binpê dike û aramiya aboriya cîhanî dixe metarsiyê.

Tengava Hormozê milkê taybet ê Tehranê nîn e, belku rêyeke deryayî ya navnetewî ye ku beşeke mezin a nefta cîhanê tê re derbas dibe.

Êrîşa li ser keştiyên bazirganî û afirandina tirsê li bazara ênêrjiyê li ser vê bingehê ye ku rêjîma Îranê hewl dide bi zêdekirina alozî û gefan, ji civaka navnetewî bacê bi dest bixe. Ev tişt xuya dike ku Tehran çiqasî binpêkariyê li hember yasayên navnetewî û ewlehiya mirovan dike.

Rêjîma Îran, di rastî de avakera têrorîzma herêmî ye. Rêjîma Îranê bi salan e ku wekî avaker û piştevanê sereke yê têrorîzma navnetewî kar dike.

Li seranserê cîhanê bi milyaran dolar ji aliyê Îranê ve ji bo avakirina torên leşkerî û komên têrorîst têne xerçkirin.

Rêjîma Îranê bi rêya Spaha Pasdaran ve, komên xwe yên çekdar teyar dike, çekdar dike û rêberiya wan dike.

Çi êrîşên Hemaşê, çi çekdarkirina Hizbullahê li Lubnanê û çi jî êrîşên Hûsiyan li Ser Deryaya Sor, hemû ev alozî ji baregeha Spaha têrorîstî ya Pasdarên Îranê ve têne birêvebirin.

Rêjîma Îranê van koman wekî emraz bi kar tîne da ku herêmên derveyî sînorên xwe bixe nav alozî û krîza berdewam.

Yek ji bingehên sereke yên fikra rêjîma Îranê, dijminatiya kûr a li dijî dewleta Îsraîlê ye.

Rêberên Tehranê armancên xwe naveşêrin û bi awayekî eşkere banga jinavbirina dewlet û welatê cihûyan dikin.

Ev daxwaz tenê ji bo propagendey navxweyî nîn e, belku siyaset û stratêjiya aliyê leşkerî yê vê rêjîmê diyar dike.

Rêjîma Îranê bi çekdarkirina komên têrorîst ên li ser sînorên Îsraîlê bi dron û balafiran, hewl dide tirsê bafirîne. Hewldana ji bo ji navbirina welat û dewletekî endamê Neteweyên Yekbûyî, siruşta tundûtûj û metirsîdar a rêjîmekê nîşan dide ku ji hemû nirxên dîplomatîk bêpar e.

**Di heman demê de ku rêjîma Îranê têrorê hinardeyî derve dike, di navxwe de jî şerekî bêrehmane li dijî neteweyên ne-fars dimeşîne. Neteweyên Kurd, Ereb û Belûç û herwisa kêmîneyên olî, qurbaniyên sereke yên van zextan in.**

Neteweya Kurd li Îranê ji dema hatina ser desthilatê ya vê rêjîmê ve, ji ber cudakarî, zext û êrîşên leşkerî di nav êş û elemê de dijî.

Kurdistan bi berdewamî ji aliyê vê rêjîmê ve tê leşkerîkirin, ji aliyê aborî ve tê fetisandin û ji aliyê siyasî ve tê helandin. Xwepêşander bi awayekî berbiçav têne tepeserkirin û çalakvan têne girtin, êşkencekirin û darvekirin.

Tirsa rêjîma Îranê ji azadî û xwebirêverbirina Kurdan gelekî kûr e. Dirûşm û banga «Jin, Jiyan, Azadî» ku ji aliyê jinên Kurd ve li Seqizê hat destpêkirin û bû tevgereke cîhanî li dijî dîktatorî û dagirkariyê, lawaziya desthilatdaran nîşan da. Bersiva rêjîmê ji bo vê tevgerê wekî her car zext, girtin û êrîşên li dijî dijberên Kurd bûn û li Herêma Kurdistanê jî êrîşî kire ser cihên sivîlan.

Cehda rêjîma Îranê, çi bi rêya destwerdanên li Tengava Hormozê, çi piştgirîkirina torên têrorîst, çi armanca eşkere ya ji navbirina Îsraîlê û çi jî tepeserkirina Kurdan û neteweyên din ên ne-fars li Îranê, rastiyekê bi zelalî nîşan dide, Ew jî ev e ku siyaseta nerm û dîplomasiya welatên rojava li hemberî rêjîma Îranê şikest xwariye û hewce ye li hemberî Îranê tund û micid bin.

Hewce ye civaka navnetewî fêm bike ku rêjîma Îranê ji bo aramiyê û jiyana hevbeş ne amade ye. Ev rêjîm, tenê ji zimanê hêzê û helwesta yekgirtî fêm dike.

Zêdekirina Spaha Pasdaran di lîsteya rêxistinên têrorîst de ji aliyê welatên rojavayî ve, danîna dorpêçên aborî û piştgiriya xurt ji bo hêzên dêmokratîk û neteweyên bêmaf li Îranê, gavên girîng in ku divê zû bêne avêtin.

Heya dema ku rêjîma niha ya Îranê li ser desthilatê bimîne, ne rêyên deryayî dê ewle bibin û ne jî Rojhilata Navîn dê aramiyê bi xwe ve bibîne.

# Di hejmara vê carê li ser zêdebûn û berfirehbûna cezaya darvekirinê li Rojhilatê Kurdistanê, me digel xatû Şilêr Bapîrî Rojnamevan û çalaka Mafê Mirovî hevpeyvîn encamp daye.



**Hevpevîn. Şilêr Bapîrî**

**Hevpeyvînkar. Sîmîn Rûhanîzade**

**1. Sedema berdewamî û zêdebûna darvekirinan di vê rewşê de çiye?**
Zêdebûna darvekirinan nikare tenê wekî diyardeyeke dadwerî bê fêmkirin. Ev yek pêwendiyek nêzîk bi rewşa siyasî û stratejiya tepeserî û zordariya Komara Îslamî re heye.
Dema ku hikûmetek rûbirûyê berfirehbûa nerazîbûna civakî, dijberiya siyasî û daxwazên guhertinên bingehîn dibe, dikare an bi rêya rêforman an jî bi tundkirina zordariyê bersivê bide. Komara Îslamî rêya duyem hilbijartiye. Cezayê darvekirinê bûye yek ji amûrên herî tund yên vê givaş û zordariyê.
Darvekirin di heman demê de çend armancan pêk tîne: cezakirina kesan, tirsandina civakê, bêdengkirina dijberiya siyasî û afirandina tirsê di nav wan pêkhateyan de ku di niha de ji aliyê siyasî ve hatine paşguhxistin. welatî bi tohmetên ewlehiyê û tohmetên wekî «dijminatiya digel Xwedê», «serhildana çekdarî» an sîxurî ku li dijî xwepêşanderan û girtiyên siyasî, tên bikaranîn.
Rêxistina Neteweyên Yekbûyî hejmareke zêde ya darvekirinan wekî beşek ji stratejiya tirsandina sîstematîk a dewletê wesif kiriye.

**2. 46 welatan daxwaz kirine ku Îran darvekirinan rawestîne. Gelo Çima berteka civaka navneteweyî çi bandorek li ser siyastên rêjîma Îranê nake?**
Gelek caran daxuyaniyên Neteweyên Yekbûyî, welatên din hatine weşandin. Di vê dawiyê de jî daxuyaniyeke hevbeş a zêdetirî 30 welatan û Yekîtiya Ewropayê, bikaranîna darvekirinan ji bo bêdengkirina nerazîbûnan şermezar kir û daxwaz ji Îranê kir ku bê derengî dawî bi cezayê darvekirinê bîne.
Pirsgirêk valahiya di navbera şermezarkirinê û encamên wê de ye.
Komara Îslamî dizane ku meric nîne şermezarkirina navneteweyî bibe sedema têçûyek siyasî an aborî. lêdiwan girîng in, ji ber ku wan binpêkariyan belge dikin û rewayî û nasandina qurbaniyan pêş dixin. Lê daxuyaniyên bi tenê nikarin bandore bixe ser desthilatdariyê; desthilatek ku gelek caran nîşan daye amade ye rexneyên navneteweyî tehemûl bike.
Ji ber vê yekê, civaka navneteweyî pêdivî bi derbasbûna ji daxuyaniyan bo givaşên berdewam û hevaheng heye: danîna cezayên amancdar li ser wan berpirsan ku rasterast di darvekirin û givaşên dadwerî de berpirsiyar in, givaşên dîplomatîk, piştgirîkirina lêkolînên serbixwe, parastina çalakvan û rojnamevanên di bin gefê de, û avakirina mekanîzmên bihêztir ji bo bersivdarkirina bikerên wan tawanan hewcye .
Komara Îslamî divê bizane ku darvekirina neraziyan an girtiyên siyasî tenê nabe sedema daxuyaniyeke din a şermezarkirinê, paşhatên kongirêt ji bo kesên berpirsiyar û encamderên wan tawanan jî li pey xwe dîne.

**3. 88 partî û rêxistinên siyasî û civakî di daxuyaniyekê de nerazîbûna xwe ji vê rewşê re nîşan dane, xêncî vê û pêkhatina kampîna «Na bo Darvekirinê» çi gavên din hewce ne ku rê li ber darvekirinan li Îranê bê girtin?**
Kampîna «Na bo Darvekirinê» pêdivî bi xebateke berfirehtir heye. Divê ew bibe tevgereke berdewam a mafên medenî li dijî bikaranîna siyasî ya cezayê darvekirinê.
Li destpêkê de, divê hemû haletên takekesî bi diyarkirî bên parastin û nasandin. Nav, wêne, çîrok û rewşa yasayî ya girtiyan nabe di nav hejmaran de winda bibin. Her kesê ku di bin metirsiya darvekirinê de ye, divê dosyeyeke vekirî hebe ku rojnamevan, rêxistinên mafên mirovan û saziyên navneteweyî bikaribin wê bişopînin.
Çalakvanên siyasî û mafên jinan, kedkar, xwendekar, kêmîneyên neteweyî û olî, parêzer, hunermend, rojnamevan û malbatên girtiyan hemû bi hevre, hêza kampînê ne û hêz bi taybetî di vê yekê de ye ku nîşan bide darvekirin ne tenê pirsgirêka komeke siyasî ya taybet e, belkû bandorê li ser hemû beşên civakê heye.
Hewce ye dosye û zaniyariyên wan dosyeyan bi awayekî sîstematîk bigihîjin Neteweyên Yekbûyî, hikûmetan, parlementeran û rêxistinên navneteweyî yên mafên mirovan, digel wan belgeyên ku paşê di pêvajoyên berpirsiyarkirinê de dê bên bikaranîn.
Divê em li dijî asayîkirina darvekirinan derkevin. Dema darvekirin dubare û sêbare dibin, xetera wê heye ku bo civakê asayî bibe. Kempîn divê bi awayekî berdewam bîne bîra civakê ku her darvekirin kuştina mirovekê ye.

**4. Piraniya darvekirinan, bi taybetî darvekirinên siyasî, li ser Kurdan û neteweyên din yên ne-Fars, wekî Belûç, Ereb û Tirk, têne sepandin, ev yek kîjan aliyê siyaseta Komara Îslamî eşkere dike?**
Bikaranîna nehevseng a cezayê darvekirinê li dijî neteweyên bê maf, pirsgirêkeke pêkhateyî ya kûr di Komara Îslamî de eşkere dike: dabeşkirina neyêksan a desthilat, maf û ewlehiyê li seranserê herêmên cuda yên Îranê de.
Pirsgirêk tenê ew nîne ku ev netewane di amarên darvekirinan de xuya dibin. Çavdêriya navneteweyî gelek caran armancgirtina nehevseng a wan netewên bindest bi belge kiriye.
Li herêmên wekî Kurdistan, Belûçistan, Xuzistan û deverên din yên paşguhxistî daxwazên siyasî, mafên çandî, nerazîbûnên aborî û pirsa nasnameyê gelek caran bi çavekî ewlehiyê tên nirxandin. Rêjîm, li şûna ku van pirsgirêkên siyasî û civakî çareser bike, wan bi pirsên ewlehiyê dibîne.
Kesek ji civakeke paşguhxistî ger çalakiyeke siyasî dike an beşdarî nerazîbûnekê dibe, Hikûmet wê çalakiyê wekî gefeke ewlehiyê pênase dike, paşê sîstema dadweriyê tohmetên pir giran li ser wî kesî de disepîne, û di dawiyê de darvekirin dibe amûra cezakirina dawî.
Dema ceza bi awayekî nehevseng bi ser pêkhateyên neteweyî û komên paşguhxistî yên taybet de tên sepandin, ne tinê divê bipirsin ka kê hat darvekirin, belkû divê bê pirsîn ka çima hin netewe çendîn caran û bi çendîn awayan rastî tundûtîjî serkut û reftarên sîstimatîk dibin.

**5. Di pêvajoya destbiserkirinê, îtirafên bi zorê û dadgehkirina girtiyên siyasî de, binpêkirinên herî girîng yên yasayî ku derdikevine hole çiye?**
Pirsgirêk li pêş dadgehê û piştî dadgehê dest pê dike: destbiserkirin, astengkirina gihîştina parêzerên serbixwe, girtina dirêj a takekesî, îşkence û givaşên derûnî. Lêkolînên navneteweyî binpêkirinên girîng yên mafên dadgehkirina dadperwerane li Îranê belge kirine, di nav wan de îtirafên bi zorê û astengkirina gihîştina parêzerên ku ji aliyê kesê ku hatiye binçavkirin. Dema tohmetên wekî sîxurî, «dijminatiya digel xwedê » an serhildana çekdarî bi awayekî berfireh rastî cezayên giran tên, çalakiyeke siyasî ya asayî dikare bi hêsanî veguhere tawana ku cezayê wê darvekirin be.
Piştre jî dadgeh xwe jî pirsiyar e. Dozên siyasî yên li Îranê gelek caran ji aliyê dadgehên şoreşê ve tên nirxandin. Çavdêrên navneteweyî û rêxistinên mafên mirovan gelek caran nîgeraniya xwe derheq serxwebûn, şefafiyet û parastina rêkarên dadweriyê de anîne ziman.
Ji ber vê yekê, dema Komara Îslamî dibêje «biryar li gorî yasayê hatiye dayîn», pirsa sereke ev e: gelo yasa bi rêya pêvajoyeke dadwerî ya azad, serbixwe û dadperwerane hatiye sepandin?
Cezayê darvekirinê tenê ji ber ku dadgehekê ew li ser kaxezekê nivîsiye, nikare rewa bê hesibandin. Dema lêkolîn, belge, gihîştina parêzer û dadgehkirin bixwe di bingehê xwe de tên binpêkirin, ew qanûnîbûna ku dewlet îdia dike nikare nedadperweriya vê pêvajoyê veşêre.

**6. Komara Îslamî cezayê darvekirinê wekî amûreke givaşên siyasî û serkutê bi kar tîne. Ev siyaset çiqas dikare vê rêjîmê biparêze?**
Darvekirin dikare tirsê biafirîne û tirs jî dikare ji bo demeke kurt nerazîbûnan bêdeng bike. Lê givaş û zordarî nikare sedemên siyasî, civakî û aborî yên krîzekê çareser bike.
Dibe ku Komara Îslamî bikaribe bi darvekirina kesekî bêdeng bike, lê nikare wan nerazîbûnan mat bike. Nikare daxwazên maf, azadî, wekhevî, rûmet û beşdariya siyasî ya jinan pêk bîne.
Bi rastî, bikaranîna îdamê dikare encamên berevajî hebe. Her îdam malbateke din a xemgîn çêdike, di hizra wan de dimîne.
Dewlet hewl dide pirsgirêkên siyasî veguherîne dosyayên ewlehiyê û paşê jî sîstema dadwerî ya sûcdarkirinê ji bo jinavbirina dijberên xwe bi kar tîne. Lê ev yek nakokiya bingehîn a di navbera civakê û dewletê de ji holê ranake.
Serkutkirin dikare alîkariya rejîmekê bike ku di demeke diyarkirî de li ser desthilatê bimîne. Herwisa dikare îro pêşî li berfirehbûna nerazîbûnê bigire. Lê ev yek digel seqamgîrî û rewayetiyê cuda ye.
Di dawiyê de, pirsa bingehîn ew nîne ka gelo îdam dikarin sibê pêşî li hilweşîna Komara Îslamî bigirin an na. Dibe ku ew demkî bikare biparêze ya kontirol bike, Lê pirsa girîngtir ev e: gelo sîstemeke siyasî dikare bi rêya tirsê paşerojek domdar ava bike? Ez bawer nakim ku bikaribe.

**Spas bo xatû Şilêr Bapîrî**

# Nemana ewlehiya rêjîma Îranê



N. Azad Kurdî



Her tişt û pêngavek ji bûyerên 7’ê Oktoberê ve guherî. Piştî 47 salan ku taboya hêrişên rasterast bo ser rêjîma Îranê ji aliyê Îsraîl û Amerîkayê ve hate şikandin, tişta ku herî balkêş bû, têkçûna ewlehiya rêjîmê bû di encama van hêrişan de ku bala hemû karnas û şirovekaran bo aliyê xwe rakêşand.

Bi kuştina Xamineyî û dehan fermander û kesên pilebilind û desthilatdarên rêjîmê û zanayên Etomî di hêrişên Îsraîl û Amerîkayê de, êdî ev têkçuna ewlehiyê gihîşe lûtkeya herî bilind.

Niha pirs ev e, çima û çawa rêjîm rastî valahiya ewlehî û ji nav çûna asayîşa navxweyî hat?
Parastina ewlehiyê yek ji fakterên girîng û sereke yên her desthilateke siyasî ye. Ji roja ku rêjîma Xomeynî di sala1979’an de hate ser kar, şandina şoreşa Îslamî ya rêjîmê bû yek ji bingehên siyaseta vê rêjîmê.

Têkdana ewlehî û asayîşa herêma Rojhilata Navîn bi rêya avakirina grupên taerorîst yên girêdayî bi rêjîmê bona rêvebirina vê armanca bingehîn a rêjîmê bû projeya sereke.

Rêjîmê li piraniya welatên Devera Rojhilata navîn de, dehan girûp û taqimên terorîstî çêkirin, bi serwet û dirafê xelkê Îranê, ev girûpên terorîstî teyar û pirçek kirin û hay dan ku şer û alozî û kiryarên terorîstî ku pilan û nexşe û biryara wan li Tehranê dihate kêşan û danê, li wan welatan de cîbicî dikirin.

Rewş geheşte cihekê ku ne tenê welatên deverê, belku her derê cîhanê kiryarekî terorîstî û alozî çêbiba, rast destê rêjîma Îranê tê de hebû û hemî welatan û bi taybet welatên nawçê û zilhêzên ku berjewendiya wan li nawçê hebû, ewlehiya wan keftibû ber metirsiyê, hemî cehda rêjîma Îranê jî eva bû ku her derê ne-ewle bike bo evê ku xwe ewlehî hebe.

Me encamên vê yekê di van 48 salên borî de dîtine ku piştî 7’ê Oktoberê her tişt guherî.

Rêjîmê herdem bi rêya propagandayê îdeaya vê yekê dikir ku Îran di warê ewlehiyê de bê hempa ye û çi kes, alî û welatek nikare vê ewlehiyê bixe metirsiyê û zirarê bigehîne wan.

Lê serkevtina Mosada Îsraîl û CIA ya Amerîka bo nav mêjî û pileyên herî bilind ên rêjîmê, karî derbe û şokên wisa mezin li rêjîmê bide ku nekarî êdî pişta xwe rast bike.

**Mosadê bi rêyên cuda cuda û taybet karî agahiyên baş û girîng li ser liv û tevgerên kesên payebilind ên rêjîmê bidest bixe. Di kêmtirî yek demjimêrê de serokê Olî Elî Xamineyî û dehan fermanderên payebilind ên rêjîmê hatin kuştin.**

Kesên ku darêjer û rêveberên sereke yên hemî teror û têkdanên li herêmê bûn û heta di asta navdewletî de jî piranî jinav birin.

Ev yek bû şoka herî mezin û bi bandor a 47 salên borî ku li rêjîmê ket û rêjîm tevlihev kir.

Rêjîma Îranê hewil daye piştî vê têkçûna ewlehiyê, ji vê şoka mezin derkeve û vê valahiya asayîşê kêmreng bike, lê kar ji kar derbas bûye.

Qeyranek ku rêjîm ligel lêgerên micid berbirû kiriye û çiqas hewil didin ku vê valahiyê veşêrin û çareser bikin, nikarin. Rast e ku rêjîma Îranê kariye bi rêya bernameya mûşekî û dronan şîyaye astengan bo Amerîka çê bike, lê li hember vê têkçûna ewlehiyê û çûna dezgehên sîxorî yên Îsraîl û Amerîkayê heta nav mêjiyê rêjîmê, vê yekê nekariye vê xala herî lawaz a rêjîmê kêmreng bike.
Gelek pisporên ewlehiyê dibêjin destpêka vê valahî û têkçûna ewlehiya rêjîmê bi kuştina bi guman a Serkomarê rêjîmê Îbrahîm Reîsî li bûyera ketina helîkoperê hate destpêkirin.

Her desthilateke siyasî ku di warê ewlehiyê de tûşî têkçûneke wiha mezin bibe, bi awayekî nerasterast hatiye hiloşîn. Gelek car jî dibe kirîz û qeyran bo vê deshilatê.

Mirov vê yekê ji rewşa niha ya rastî rêjîmê bûye, bi eşkere dibîne ku pirûpagande û îdeayên rêjîmê pûç û vala kir. Di mehên pêş de emê encamên vê têkçûna ewlehiya rêjîma Îranê zêdetir bibînin…



# Di navbera tirs û hêviyê de: Kê dê kurdan biparêze?



N. Sefiye Xalidî



Bidarvekirinên li Îranê û tirsa vegera terorîstên DAIŞê- ev yek ji bo gel çi wateyê dide?
Gelê Kurd di navbera tundiya dewletên dagirker, zêdebûna bêewlehiyê û tirsa ji vejîna terorê de asê mane, bi milyonan mirov rûbirûyê pêşerojeke nediyar in. Îdamên li Îranê ne tenê derbarê mafên mirovan û dadmendiyê de pirsan derdixin holê, belku di heman demê de tirsa ji alozîyên zêdetir li Rojhilata Navîn jî kûrtir dikin.

Îdamkirin, ji mirina kesekî tenê wêdetir e. Ew bandorê li malbat, heval û civakên tevahî dike. Bi taybetî dema ku mirov ji ber sedemên siyasî rastî zilmê tên, an jî dema ku derbarê dadperweriya pêvajoyeke hiqûqî de guman hebin, ev rewş dikare atmosfereke tirsê biafirîne.

Li Îranê, gelek kes ditirsin ku eger ew bi awayekî eşkere nêrînên xwe bînin ziman, li dijî hikûmetê nerazîbûnê nîşan bidin an jî daxwaza guhertinê bikin, encamên neyînî derkevin holê. Tirsa ji girtinê, muameleya xirab an jî heta cezayê darvekirinê, dikare bibe sedem ku mirov bêdeng bimînin, her çend ew li dijî rewşa siyasî bin jî.

Ji bo kesên nêzîkî wan kesên ku hatine îdamkirin, ev rewş bi gelemperî xemeke kûr û hesteke bêçaretiyê tîne. Yên din jî li van bûyeran wekî hişyariyekê dinêrin: eger kesek ji ber baweriyên xwe neçar bimîne ku jiyana xwe ji dest bide, ev yek wê pirsê derdixe holê ku gelo jiyan û paşeroja mirov bi rastî çiqas ewle ne. Lê tirs ne tenê bertek e. Hinek kes xwe paşve dikişînin, lê yên din hêzên xwe dikin yek, ji bo mafên mirovan têdikoşin û tevî rîskan jî dengê xwe bilind dikin.

Ji bilî tundiya ku ji aliyê dewletê ve li Îranê tê kirin, gelek kes li ser pirseke din difikirin: Gelo rêxistineke terorîst a wekî DAIŞê dikare dîsa bigihîje wê asta hêzê ya ku çend sal berê hebû? DAIŞ ku wekî Dewleta Îslamî jî tê naskirin demekê kontrola herêmên berfireh li Iraq û Sûriyeyê di destê xwe de digirt. Vê rêxistinê hovîtiyên mezin pêk anîn, sivîl kuştin, zilm li kêmîneyên olî kir û tirs û xof li derveyî herêmê jî belav kir. Herçend DAIŞê kontrola xwe ya berê ya li ser axê ji dest daye jî, ev rêxistin bi temamî ji holê ranebûye. Şaxên herêmî, torên terorîst û propagandayên radîkal hîn jî ji bo ewlehiya navneteweyî dibin pirsgirêk.

Bêîstiqrariya siyasî, pevçûnên çekdarî û hilweşîna pêkhateyên dewletê dikarin şert û mercên wiha biafirînin ku komên tundrew hewl didin sûdê jê werbigirin. Zehmetiyên aborî, dûrxistina ji civakê û belavkirina bi mebest a îdeolojiyên tundrew jî dikarin di radîkalbûna kesan de rolekê bilîzin.

Lê belê, ev nayê wê wateyê ku darvekirinên li Îranê dê bixeber bibin sedema bihêzbûna DAIŞê. Di navbera van bûyeran de tu pêwendiyeke neçarî tune ye. Ya girîng ew e ku rewşa ewlehiyê li herêmê çawa pêş dikeve û ka rêxistinên terorîst derfetên nû bi dest dixin da ku endaman kom bikin û êrîşan amade bikin.

Gelo li Rojhilata Navîn aloziyeke mezin li ber derî ye? Rewşa siyasî ya li Rojhilata Navîn aloz e. Zordariya dewletê, pevçûnên herêmî, tundrewiya bi motîvasyona olî û têkoşînên hêzê yên jeopolîtîk, hemû dikarin bandorê li ser hev bikin. Her ku tundûtûjî zêde dibe, gelek kes ditirsin ku bûyerên cuda û sînorkirî veguherin pevçûneke berfirehtir.

Lêbelê, pêşveçûneke wiha ne neçar e. Îdamên li Îranê, bi serê xwe, ne delîlek in ku şerê nû yê mezin an jî vegera DAIŞê bo ser desthilatdariya li ser axê, nêzîk e. Digel vê yekê, divê fikarên xelkê bi cidî bên girtin. Ji bo kesên ku berê şer, zilm an teror dîtine, pêşveçûnên nû dikarin bîranînên serpêhatiyên trawmatîk ên borî vejînin. Her wiha, kesên ku ji van bûyeran dûr dijîn jî, bi dîtina dîmen û raporan, dibe ku ji bo kesên xwe yên hezkirî û ji bo paşerojê bikevin nava tirsê.

Ev yek ji bo Ewropayê çi encaman tîne? Pêşhatên li Rojhilata Navîn li Ewropayê jî ji nêz ve tên şopandin. Bîranînên êrîşên terorîstî yên berê û hovîtiyên ku ji aliyê DAIŞê ve hatine kirin, di hişê gelek kesan de şopeke kûr hiştine. Lewma, fikarên derbarê îhtîmala ji nû ve serhildana rêxistinên terorîstî, tê fêmkirin. Di heman demê de, girîng e ku mirov di navbera rîskeke gîştî ya ewlehiyê û gefeke berbiçav û nêzîk de cudahiyê bike.

Divê dezgehên ewlehiyê pêşhatên muhtemel bişopînin, agahiyan biguherînin û li dijî torên terorîstî tevbigerin. Di heman demê de, divê tirs ji terorê nebe sedem ku guman li ser komên tevahiya gelan were danîn. Divê ne gelê Îranê û ne jî misilman bi gîştî, bi kiryarên rêberên siyasî an rêxistinên tundrew re bên wekhevkirin. DAIŞê bi xwe jî gelek misilman kuştine û rastî zilm û zordariyê anîne.

Civakek ewlehiya xwe ne tenê bi rêkarên li dijî terorê, lê herwisa bi serweriya yasayê, hevgirtina civakî û parastina mafên mirovan diparêze.
Cezayê darvekirinê, zordariya siyasî û pêvajoyên dadwerî yên neheq, têkildarî pirsên bingehîn ên rûmeta mirovî ne. Dema ku kes ji ber sedemên siyasî tên bêdengkirin, tenê ew kesê ku rastî vê yekê hatiye zirarê nabîne; her wiha baweriya bi dadweriyê, saziyên dewletê û îhtîmala guherîneke aştiyane jî dikare zirarê bibîne.

Di heman demê de, ezmûna bi rêxistinên terorîst re nîşan dide ku tundî û zordestî, ewlehiya mayînde misoger nakin. Têkoşîna bi bandor li dijî tundrewiyê, ne tenê tedbîrên ewlehiyê, lê her wiha aramiya siyasî, perwerde, parastina kêmneteweyan û rêyên çareserkirina nakokiyan bêyî ku serî li tundiyê were dayîn, hewce dike. Ji ber vê yekê, dê gelekî sade be ku mirov rewşê tenê wekî têkoşîna di navbera dewletan û rêxistinên terorîst de bibîne. Di naveroka vê mijarê de, mirovên ku dixwazin jiyana xwe ji tirsê dûr bijîn, hene. Darvekirinên li Îranê û gefên berdewam ên ji aliyê DAIŞê ve tên kirin nîşan didin ku aştî û ewlehî çiqas lawaz in. Ew wekî bîranînek xizmetê dikin ku tundûtûjiya siyasî encamên dûr û dirêj hene û divê civaka navneteweyî binpêkirinên mafên mirovan û gefên terorîstî bi ciddî bigire. Lêbelê, divê fikar neguhere nav teqeziya karesatek ku hîn çênebûye. Her çend DAIŞ hîn jî wekî pirsgirêkek ewlehiyê dimîne jî, pozîsyona wê ya berê ya hêzê bixweber nehatiye vegerandin. Bi heman awayî, zêdekirina zextê li Îranê nayê wê wateyê ku tevahiya Rojhilata Navîn dê bikeve şerekî hîn mezintir.
Tiştê ku mirovên di vê rewşê de hewce dikin, agahiyên pêbawer, parastineke bi bandor û misogeriya wê yekê ye ku jiyan û azadiya wan girîng e. Çimkî pirsa sereke ne tenê ew e ku çawa rê li ber wê were girtin ku rêxistinên terorîst ji nû ve hêz bi dest nexin; her wiha ew e ku cîhanek were avakirin ku tê de mirov neçar nemînin ji bo jiyana xwe bitirsin — ne ji ber dewleta xwe bi xwe û ne jî ji ber tundiya terorîstî.

Gelê Kurd û sivîlên din ên ku ji zulma siyasî, şer û tundûtûjiya terorîstî dikişînin, bi lezgînî hewceyî parastineke mezintir û piştgiriya navneteweyî ne. Dema ku dewlet di peydakirina parastineke têrker ji bo nifûsa xwe de nikaribin, divê mirovên bêguneh bi tena serê xwe neyên hiştin. Li her cihê ku gengaz be, divê sivîl planên awarte pêş bixin, belge û dermanên pêwîst li ber dest bigirin, piştgiriyê bidin hev û rewşên xeternak di wextê xwe de bihêlin. Di heman demê de, ji bo pêşîgirtina li binpêkirinên mafên mirovan, pêdivî bi rêyên revê yên ewle, alîkariya mirovî û zexteke navneteweyî ya bi bandor heye. Dema ku mirov ji ber paşxaneya xwe an baweriyên xwe yên siyasî rastî gefê tên, divê civaka navneteweyî bêdeng nemîne. Mafê her mirovî heye ku di ewlehî, azadî û rûmetê de bijî - bêyî ku koma etnîkî an cihê jidayikbûna wî/wê çi be.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Hişdariya Raportorê Neteweyên Yekbûyî: Zêdetirî 100 girtî di bin metirsiya darvekirinê de ne




“Leopoldo Maldonado Gutierrez”, raportorê taybet yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, nîgeraniya xwe li derheq asta bilind a darvekirinên siyasî li Îranê anî ziman û ragihand ku zêdetirî 100 girtiyan di metirsiya darvekirinê de ne.
Li gorî daxuyaniya vî raportorê Neteweyên Yekbûyî, Saziya Lêborîna Navneteweyî di sala 2025an de herî kêm 2 hezar û 159 bûyerên darvekirinê li Îranê de tomarkiriye; ev jî bil-indtirîn rêjeye salane ye ji sala 1981an ve.
Wî herwisa destnîşan kir ku di sala 2026an de herî kêm 34 kesên girêdayî xwepêşandanên meha Befranbarê hatine darvekirin. Ji destpêka meha Xakelêweya îsalê ve jî herî kêm 46 girtiyên siyasî û nerazî hatine darvekirin. Û 37 kes ji wan kesan bûne ku di xwepêşandanan de hatibûne binçavkirin, 9 kesên din jî bi tohmeta pêwendîdar bi alî û rêxistinên dijberên rejîma Komara Îslamî, cezayê darvekirinê bi ser wan de hatiye sepandin.
Navbirî bi bîranîna tawan û komkujiyên salên 60an, bi taybetî sala 1367an ku di wê de 30 hezar girtiyên siyasî
hatin darvekirin, daxwaz kir ku ceza darvekirinê bêyî derengî bê betal kirin.

Wî ji bo piştgirîkirina kampîna “Sêşemiyên Na Ji bo Darvekirinê ” ragihand ku ji nîvê şeva Sêşemê, 28ê Rezberê, greva 24 demjimêrî dest pê dike.
Rejîma Komara Îslamî ku di bersivdana daxwazên xelkê de bêçare maye, darvekirinê wekî amûrekê ji bo belavkirina tirsê û serkutkirina dijberên xwe yên siyasî bi kar tîne.

## Givaş bo ser welatiyan li Kurdistanê de zêdetir dibe



Li heyama çend rojên derbasbûyî de, welatiyekî Îlamî siza bi ser de hate sepandin, her li Îlamê yekî dine jî hate girtin û çarenivîsa yek din jî nexûyaye.
Li Mihabadê Îdareya Îtilaata rejîmê welatiyek destbiser kir.
Li Kamêranê werzişvanek çendîn caran bo navendên tepeserkare rêjîmê hate gazîkirin.
Li gorî raporta Hengawê, Mîlad Esedî, xelkê Serteng ê ser bi bajarê Bedre a Parêzgeha Îlamê û ji girtiyên nerizatiya Befranbara sala derbasbûyî, ji aliyê dadgeha Înqilaba rejîmê ve li Îlamê, sizaya 2 sal û 6 meh girtinê bi ser de hate sepandin.

Herwisa li gorî raporta Rêkxirava Mafê Mirov a Kurdpayê, Şerîf Aşnab, xelkê Melekşayî ya îlamê, roja Çarşemî 8ê Rezbara 1405an, ji aliyê hêzên tepeserker ên rejîmê ve bi bê belgeya yasayî, bi lêdan û tundûtîjiyê hate girtin û bo cihekî nexûya hate veguhastin.
Li gorî raporta Hengawê, Îsmaîl Sofî Mîne, welatiyê temen 54 salî xelkê Mihabadê, li en-cama êrîşa hêzên Îdareya Îtilaata rejîmê bo ser mala xwe hate girtin û bo cihekî nexûya hate veguhastin.
Li gorî raporta Kurdpayê, Sîna Perwîzî, 38 salî û xelkê gungê (Ellk) ser bi Kamêranê ku werzişvan û rahênerê leşciwaniyê bûye, çendîn caran bo îdareya Îtilaata rejîmê li Kamêranê hatiye gazîkirin û givaş xistine ser.
Herwisa bi derbasbûna 2 roj bi ser girtina Îrfan Keremûweysî, ê 19 salî û xelkê gungê Pakill Giraw, ê ser bi bajarê Bedre li parêzgeha Îlamê, tu zaniyariyek li warê çarenivîs û cihê ragirtina wî li ber dest de nîne.
Gorî Kurdpayê Muhsin Mewlûdpûr, lîstikvan û rahênerê qutabxana Futbolê, xelkê bajarê Şinoyê, ev 3 roje ku ji aliyê hêzên ewlehiyê ye rêjîmê ve hatiye girtin û heya niha jî li derheq sedema girtina wî û cihê ragirtin û qedera wî ti zaniyariyek li ber dest nine.

## Girtiyekî dine siyasî û yek ji xwepêşanderên befranbarê hate bidarvekirin



Ligel berdewamiya pêla cîbicîkirina cezayên darvekirinê di bin desthilata rêjîma Koma-ra Îslamî ya Îranê de, desthilata dadwerî ya rêjîmê, roja çarşemê 22ê Rezberê, nûçeya darvekirina Elî Sîna Mustefewî, girtiyê siyasî û ji desteserkiriyên xwepêşandanên meha Befranbarê li bajarê Kermanê ragihand.
Ajansên «Mîzan» ku ser bi dezgeha dadwerî ya rêjîmê ye, ev girtiyê siyasî û yek ji xwepêşanderên Befranbara 1404an bi tohmeta encamdana çalakiya çekdarane li bajarê Kermanê darve kiriye.
Rêjîmê herwisa Mustefewî bi şandina wêne û vîdeoyan ji bo medyayên derveyî welat, hem di xwepêşandanên Befranbarê de û hem jî di şerê van demên dawî de, tohmetbar kiriye.
Elî Sîna Mustefewî ku roja sêşemê nûçeya veguhastina wî bo odeya takekesî hatibû be-lavkirin, di berdewamiya pêla cezayê darvekirina xwepêşanderên Befranbarê û girtiyên siyasî yên bi tohmeta sîxuriya ji bo Amerîka û Îsraîlê de, hat darvekirin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (528)